في الشرق الأوسط، النظام التركي مثل واضح في ظل حكومة العدالة والتنمية، تكتنوج يحاول إعادة صياغة الهوية الاجتماعية بشكلها المتعدد لكن بما يخدم الهوية المتمكنة بالنظام الهيكلي الآتوني للدولة، فحاولت قبل الامكان أن تعرف البعد المتعدد للمجتمع التركي ضمن هوية تركية متعددة المشارب، فاصطدمت في نهاية الامر بعمقها الذاتي عن ولادة أي شيء منتج قابل للحياة.

الهوية المتعددة تعني احترام خصوصيات الجماعات المشكّلة لمجتمع ما، وإعطائهم شخصيتهم الاعتبارية الكاملة، ليتمكنوا فيما بعد من فرز منتج اجتماعي يصب في خانة الوطنية الشاملة الجامعة للهويات المتفرعة منها، لا المقصورة لهم، فلا يمكن أن أطلب من الكردي أن يحمل هوية وطنية بصفات لا تعود إليه.

الثورة السورية في مرحلة الاصطفاف القومي والطائفي والاستقطاب السياسي خلال الحرب الأهلية العابرة لحدودها، أفرزت فكراً اجتماعياً مشوهاً لا يختلف عن الأردوغانية في تعريفه للهوية المتعددة.

فتراهم اقتربوا «الشعب السوري واحد» في إشارة مبطنة أن حدود الاعتراف بالكرد هو ضمن رؤية تنزع من الشمولية القومية الحاكمة للسوريين، ومن لم يعد باستطاعة أي نظام سياسي إخفاء التركيبة السكانية ضمن حدوده الجغرافية الراهنة، ولم يعد بالإمكان مواجهة الفشل الذي أصيّبت به الأنظمة الشمولية بالفعّال والإدعاء الكاذب!!.

وأصبح من الواضح أن السبب الأساسي في فشل هذه الكيانات هو البناء الاجتماعي المبني على الاقصاء والإلغاء مما أدى إلى انهيار المنظمات الاجتماعية وفشلها قبل الانتفاضة كونها القوة الحقيقة في البناء الهرمي للمجتمعات.

في بداية الألفية الجديدة بدأت الأنظمة هذه بمحاولات إيجاد حلول من خلال اطروحات لمفكريها لإعادة دمج مكوناتها الإجتماعية ضمن التعريف الهوياتي الوطني لها باعتراف خمول بالتنوع العرقي والديني والتلقافي لشعوبها!! هذا التمييع الواضح والاتفاق حول المعضلة الأساسية كان سبباً جديداً في تصضم الأزمات.


فالإرث المرافق لل المشكلة كبير و يتطلب شرح حقيقي للأزمة وتأمين حلول واضحة و زمن كافي لإعادة بناءه. ظهرت حينها محاولات إعادة تعريف الهوية الشاملة المتعددة للمجتمع المتعدد التركيب الثنائي والديني دون أن ت Kami استعداد لإعادة تعريف الهوية الوطنية وفق هذه الهوية الاجتماعية المتعددة.

بتناول يسيط لتعريف الهوية وأشكالها يمكننا الوقوف على التمييع الممارس من قبل الحكومات في البحث عن مخرج لها من خلال تعريف للهوية المتعددة وإعطائها صفات تخدم نظمتهم الشمولى .

المعضلة تتجسد في المستوى الشعبي من خلال إصرار الشرحة لاجتماعية المترعرعة تحت سلطان هذه الأنظمة وأفكارها على تمييع الهوية المتعددة بمقاييسه تعود إلى الجذر الشمولي الرافض للاعتراف بالآخر



MALVA ... HÊWÎ PIRTÎKA TË DAWXIVE



Malva Reng Li Pey Xwe Hiştin û Bar Kir

Hunermendê Kurd Umer Hemdî ku bi navê Malva tê naskirin, di dawiya temenê xwe de bi nexweşîyeke demdar ketübû, ku ew jî nexweşîya "Penceşîr" bû, li bajarê Viyêna li welatê Nemsayê, dûrî welatê xwe, û piştî şerekîdirêj bi vê nexweşîyê re jiyanâ xwe ji dest da û koça dawî kir.

Tabloyen Hunermendê cîhanî "Malva" ku ew yek ji damezrênerê "Dibistana Derbirîn" ye, li navdartirîn pêşengê cîhanê mîna Parîs, Şîkaxo, Berlin, Los Enculus, Roma, û Mosko, hatin pêşkêşkirin, û li heman pêşengan bi hezarên dollarê Emrîkî hatin firotin.

Hemdî di jiyanâ xwe de ji bîlî hunerê, bi nivîsa helbest û nivîsên rexneyî ji mijûl dibû, û gelej ji tabloyen wî di warê hunerê de bûne nameyên dektora.

Kurtejiyana (Malva) ..

di sala 1951ê de li gundê Til Nayif, li parêzgeha Heseke li Rojavayê Kurdistanê jidayik bûye û hîn zaro bû çavê xwe li ser nîgarkêşiyê vekir û jê hez kir.

di sala 1970ê de Piştî xwandina nîgarkêşiyê wek mamostayê hunerê li Sûriya kar kir. Di navbera salên 1971 - 1978an de li bajarê Şamê karê grafik û nîgarkêşiyê kir.

Piştî çûna Beyrûtê di sala 1978an de bi demekê, berê xwe dide welatê Nemsayê, û jiyanâ xwe ta rojêñ dawî li wir berdewam dike

Umer Hemdî (Malva) ji sê jinan çar keç û kurek wî heye.

Evîn û Huner (Di Navbera Qesengiya Pilaton û Desthilata Ibin Xeldûn De)

Xweşnav Heso

“Di vê bîrdozeyê de, Ibin Xeldûn li ser yeksaneya jiyana destelatê diçespîne, û bi vê şeweyê huner kir berdestê destelatê”.

“Pilaton dibîne ku evîniya herî bedew û bilind ewe ya ku xwe dûrî bercewendiyan dibe , ya ku dûrî daxwaz û xwestekan be”

bin Xeldûn (1332-1406 .z.) dibîne ku huner û şûr li destê xwedanê dewletere de her wekî hev in, carnan şûr bi kar tîne û carnar hunerê bi cih tîne .

Ber ku bandora hunerê ji bandora hêz û zoriyê ne kêmter e, rast e ku huner û hêz nakok in, lê, heger yek ji wan li kar be , cihê yê din ewê nebe, û yek ji wan bêyî yê din nabe û serast nabe, herdû hevdû temam dikin ! Heger huner li kar be, ew ê hêz raweste, û gava hêz li dar be bê guman ewê huner li paş be .

Ibin Xeldûn bi vê wateyê me vedigerîne navnîşana huner û destelatê bi têgeha berfereh, ango li pêştirya destelatê bo birêvebirin û bideşxistina hunerê, û rawestana wê li kar û nave-roka berhemên hunerî .

Lê kengî rola hêzê ye, û kengî rola hunerê ye?

Li gorî Ibin Xeldûn, rola hêzê di destpêkê û dawiyê de ye, da ku kok û damarê destelatê bi cih bîne û biçespîne, di nava van her du qonaxan de xwedanê hêzê baştırin karmend in, û cihê wan yê herî bilind e.

Û rola hunerê di nava jiyanâ destelatê de pêk tê, di navbera destpêk û bervî dawiyê de xwe bi cih tîne, gava ku hêmenî û aramî belav be, û dema ku êdî hêz nema gerek be.

Li ser bingeha vê qonaxê, komar an jî destelat ber-vî dîmenekî din de diçe, û diyar dibe di vê qonaxê de peydabûna hunerê ya ku

girdaya aştiyê û hêmeniyê ye, û derbaskirina pêdiviyen sereke bo hemîşeyê.

Di vê bîrdozeyê de , Ibin Xeldûn li ser yeksaneya jiyana destelatê diçespîne, û bi vê şeweyê huner kir berdestê destelatê.

Û li gorî vê nerînê eger huner bi tûmî têkeve destê destelatê, gerekîya destelatê bi çek û hêza zorkirinê êdî namîne di demên vehesiyyê de.

Ibin Xeldûn dibîne ku bi alîkarî û besdariya nivîskaran kar û barêñ komarê serast dibe û saz dibe, û bi şîret û rexnîn wan mîlet çak dîbin û bajar şen dibe. nivîskar û huner kar ji boyî padîşah çav û dev û guh in, û meşîyê durist û rast in da ku ew tiştîn çewt û xwar saz bikin.

Têkiliya huner û destelatê destpêkeke serekî ye ji gerekîya destelatê bo huneriyê , bo ku her dem huner deveren destelatê dozan û rast bike, û di riya şîretîn wê ji gel re bi pêdawistêne meşî û peyvîn giran û tegeh .. ji lewra huner kar ji destelatê re dibe çav û dev û guhdan li gorî nerîn û bîrdozeya Ibin Xeldûn.

Evîn û Qesengî li gel Pilaton

Pilaton an jî “Eflatûn” yê ku bêhtir navdar e bi bîrdozoya nemûneyî ,baldarê evîn û qesengiyê jî bû , ber ku qesengî yek ji sêyaneyen serekî ye di nasnameya Fel-sfê de .

Evîn ewe têgihişa di navbera cihana nemûneyî û rastiyen hemîşeyî bike .



û hestyarî de ye, Pilaton dibîne ku evîniya herî bedew û bilind ewe ya ku xwe dûrî bercewendiyan dibe, ya ku dûrî daxwaz û xwestekan be, ji vê yekê, ewê evîniya di navbera jîn û mîr de ne durist be ji ber ku ew li ser daxwazîn laş û hestêñ dilbijok peyda bûye û xuya dibe. Pilaton ev nerîn ji Sokratos wergirtiye, ne xem e, ma ne şagirt bû li gel wî?

Ji vê hêlê de Pilaton dît ku evîna durist divê ku di navbera du mîran de pêk bê, da ku ew evîn dûrî xwestekân dilbijok be, û her dem li rasteqîneya evînê bigere bêyî li bercewendiyan bixebite û bikole!

Armanca evînê qesengî û çakî ye, û heger em bizanîbin di felsefeya Yonanê ya kevn de têkiliya sûdekaran û qesengiyê ne cêwaz bû, em ê nas bikin ku evîn ewe daxwaza çakîyê û qesengiyê di vî warî de.

Evînî mebestek berz û bilind e ji ber ku ew babeta xwe û mijarêñ xwe derbasî cihana nemûneyî dike, ev cihana ku tê naskirin bi Maf, çakî û Qesengiyê de, û heger çakî û qesengî mebesta evînê be, gerekî vê gavê ku afrandina hunerî û qesengî bike, û çakîyê bikar bîne!

Evînî li gel Pilaton naxwe ewe kêşeya durist e ya ku afrandina hunerî ya resen peyda dike, û evîn ewe her ku dûrî bercewendiyan be, ji vê yekê de humersazî bêhtir resen dibe da ku nûneratiya cihana nemûneyî û rastiyen mîna malperen cihanî (Google,

D i destpêka çerxa 19an de, pêşveçûnek mîna şoreşekî di warê medya û ragihandinê de çebû, û geşbûna teknolojiya roj bi roj bandora xwe li ser ragihandin û alavêñ pêwendiyê kir, ku ew ji asteke bilind kir asteke di demek pir kurt de, û dersetek mezin ji dezgehêñ medyakaran re peyda kir ta ku bi serbestî karê xwe bike.

Ev pêşveçûn û geşbûn weke ku berhemên wê yê baş hebûn, weke her tişti di jiyanê de dijberê wê jî hebûn, ku hêzenî mezin ji bo berjewendiyêñ xwe yên Taybet bi kar anîn, bi Taybet di salêñ “şerî sar” di nav hêzenî ku desthilatdar bûn di cihanî de, dema ku medya ji berjewendiyêñ Taybet yên Bazîrgan û dolemendan dihat bikaranîn, û ew bû weke cûreyeke nû di şerî cihanî de, ev azarî ma berdewam hetanî salêñ Notî di çerxa bûrî de, ku şer bi dawî hat, û piçek serbestî di warê ragihandinê de çebû, hîno hîno ragihandin û desthilat ji hev vejetiyan, ta ku gihiş astekî serbestiyek diyar di vî warî de hat holê.

Di destpêka vê çerxê de, alavêñ medyayê xwe çeng kirin, û xwe di ser pir pelikan re avetiñ, bi Taybet pişti ku şoreşâ “Tora enternet” ê rûda, û şêwe û alavêñ têkiliyê û pêwendiyê bi hesanî bûn ber destê her kesî, di heman demê de sîrmîn nû derketin, mîna “Wetâliyê Rojnamevan” û “maşen weşana ramanañ” ku dan û standin bi mijarêñ medya yê re bûn bi awayek yasayî, ne her kes kare destdiriyê ser maşen kes, dezgeh, û navandan bike, ne jî ramanan bidize!!.

Belê ev gavêñ xuya di warê pêwendiyê û ragihandinê de, ne ji valahiyê hatin, pir xebatkar li pey vê yekê hebûn, û pir sedem reya vî karî xweş kirin, bi Taybet ew melperen Taybet di warê pêşkeşkirina agahî û zaniyariyan mîna malperen cihanî (Google,

Hunermend İmad Darî Dilê Xwe Vedike û Daxive

-Di riya rojnameya Bûyerpress re ez bangekê bo Seîd Gabarî

dışinim û dîbêjim ez dixwazim ahengekê pê re lidar bixim.

-Bi rastî Ez dixwazim di radyoya ARTAFM de kar bikim lê derfet nedane min.

-Eger hûn alîkariyê bikin, bawer bikin ez ê li gor wê alîkariyê bim, ji ber ez dizanim ci li cem min heye.

-Min ew gotinê helbesta xwe ezber dikirin, û yekemîn helbest strana min a "Tu hungivê Ser Zimana" û "Ava Ferat" bû.

-Hunermend Zoya jî bi me re di strana "Ava Ferat" de alîkar bû, ew jî weke kewres bi me re bû.

- Hezkirin çêbû, û di dilê min de ma û min negot, ceger bi min re tune bû, û ditirşam ez jê re bêjim ew bêje na!..

- Çima?

Min dixwest li min guhdar bikin, ji ber hîn navê min jî dermeketibû, min dixwest ew hest bimîne, kesê mero nas neke jî li meroz guhdar dikin.

- Pişti kasête te ya şahîyan, têkili bi te re bûn ji bo tu şahîyan lidar bixe?

Di wê demê de têkîlî çebûn, di wê demê de malbetek hebû, pişti li kasête guhdarî kirin, ji min re gotin em dixwazin ti were şahîya me lidar bixe. Ji min re tiştekkî xweş bû, û zor bû jî, ji ber şahî dema wê dirêj e, û hîn wê demê min şahîyen taybet bi navê xwe lidar nexistîne, û wê tipa muzîkî bi navê min be, û serkeftîn û binkeftîna goventedî ji min dihat xwestin, min ji xwe re got eger ez bêjim na, wê bibêjîn ev baweriya wî bi wî nâyî, û eger bibêjîn erê ditirşim hindek astengî derkevin, min ji xwe re got bera ew astengî ji min re bin ya ez ê bi ser bikevîm û ya ez ê dest ji vî karî berdim!..

We bi ci qasî wê çaxê lihev kir?

Di sala 200an de bû, guman dikim derdora 4000an bû, ew jî hemâ bo kîrya alavên mûzikî bûn, Org bi me re hebû, ew jî di hewşekî de bû.

- Dema gotin bûk û zave hatin, ci bi te re çêbû?

Li gor ên li dora min ji min re gotin, riwê min sor bûbû û ez geleki bi tirs bûm, ez bi xwe hest bûm ku weke rîfekî bi min re çêbû, ji ber zor e ku giş li hêviya te bin, û ez néviyê stranê jîbir bikim, min dengê kîlîfî û çepkan kir, min dengê Orgê hilda û min strana "Sed piroz û şahîb be bo bûk û zava" got.

- Te çawa hewldana nîvisandinê dîkir?

Ez caman bi tenê dimam, mijarek hebaya, ez tê de diramyam, min ser diñisand, min ew gotinê helbesta xwe ezber dikirin, û yekemîn helbest strana min a "Tu Hungivê Ser Zimana" û "Ava Ferat" bû.

- Rewsâ evînê çawa dihat ber çavê te, xeyda xort û keça, dûrbûn û nézîkbûna wan, te çawa didit, te ji hinekan hez kiribû?

Helbet, hezkirin çêbû, û di dilê min de ma û min negot, hişez helbestan ji binvisim, ji xwe dema min ew gotin datanîn, min ji xwe re digot min ser filanê nîvisisi, min tu carî navê wê neanî ser ziman û ñe di helbestê de ji, tu kes ji ji kesen dor min bi vê yekê hest nebû, hindek dost û heval têbîn kiribûn, û nas kiribûn, lê min jê re negotibû, ceger bi min re tune bû, û ditirşam ez jê re bêjim ew bêje na, heta ez li jiyanê sax bin ez jîbir nakim.. ji ber rewşa min a astengdar, min ew nedidit.. ji ber tevgera wê, dan û stendina wê, û gotinê wê min jê hez kir, min ji yên derdora xwe dipirşî ka pesnê wê ji min re bidin, bê çawa ye, dirêj e yan kin e, esmer e, gewr e, pir dirêj e, gelektiştê min di xeyla xwe û dilê xwe de datanî û pîre wan tistan li gor hevalen min ji min re digotin rast bûn.. Carinan hevalen min ji min re digotin; em bala xwe didin te dema ku dengê filan keçê tê de yan tu dizanî nîzîki te bûye, ji riwê te xuya dike, tu li bin guhê hev dikeve.. û ew bi xwe qet negîha asta ku çirokek evînî ñ nav me de hebe, ji bilî gotinên rojane, mîna silav û pîra li hal û demê merov

- Dema te bîryara kasête da, te xwest tu ci şêweyê strana çê bike?

Bi rastî min xwest ez tiştekî daxim rengi nüjen be, wek dilana "Şêxanî" û aliye dî ya "Hörizî" bû, stran hemû gelerî bûn, stranek hunermend Diyar wê demê bi navê "LoLo Lawiko" hebû, ji xwe di wê kasête de me "Org" tenê bikar anî, û ji ber di wê demê de ew belavkirina mezin nehate belavkirin, derdora 200 kasêt hatin tomarkirin, kompaniyê hindek kasêt ji wan dane me, û me ji di riya xwe re da dosût û hevalan, ew bi xwe destpêk bû, û zêde nehat belavkirin, lê nebû sedema reşbinîyê li gel min, tev wilo jî ji min re dihate gotin ku ez biser ketime, û pesnê min dihate kirin.

- İmad Darî carekê li zikakekê buhuriye û dengê kasête xwe kiriye?

Rast e, ev çêbûye. Carekê ez û hevalê destxwesî orgê, di kolanekî re derbas bûn, hindekan li kasête guhdar dikir, ez pir şad û kîfeş bûm, û di heman demê de min nema dixwest ez xwe pêş ê guhder bikim, min got bera ew hest bimîne, li mirov guhdar bikin û merov nas nekin.

- Vê qonaxâ evîndariyê hiş İmad Darî helbeste binivise û bîryarê bide ku kasêtekê derxe, te çawa helbesten xwe hilbijartin?

Gelek helbest û muzîk hebûn, lê ez bêtir li ser staylê wan sekînîm, stran pîr bûn, lê min stayl hildibijartîn. Di kasête xwe ya yekem de ez li helbestvana negeriyam, ji nişîş min bûn, min biryar stend ku helbest û muzîk û ta awaz jî yê min bin, ji ber min xwe didit ez gîhiştime asteke nexerab. Sedema vê yekê jî; dibi ji ber ku meydân valabû, û ez hest dibûm ku mirov ci bibêje wê were qebûkirin.

- CD ya te çend stran bûn?

Ew (9) stran bûn, hemû jî ji helbest û awazîn min bûn û bi dengê min bû, ji xwe staylê min di destpêkê de nêzî stayl Tirkî bû, û awazî min bi ser de dicûn, lê dema min stran datanî, min helbest û awaza xwe bi hev re digitin, ji ber her bi hev re dihatin, ev jî bû sedema ku ez ezber bikim û di meşîyê min de biçesibe.

- Wek min ji devê te bihist strana te ya ku ci girtiye di CD ya te ya yekem de ye, tu dikarı ji me re helbesta wê bibêjî?

Tu hingivê li ser zîmanâ Bejna te takî rîhan e Ez xulam dengê tey zelal Xweşîr e ji saz û kemana Dînya tev de, û tu li alîkî Wek te nabînim li cîkî Evîn ne ewqasî zor e Qet netirse tu bi xwedekî Gava tu kefî dilê min Te ji serî bir aqîle min Tîrsa min navê te bêjim Heval bibin dijminîn min

- Pişti strana te ci girt, te bihist ku tu kesi ew strana te gorîye?

Belê min bihist, ji ber pişti me ew CD derxist bi salekê yek i xwediyê kompaniyê ji Batmanê hate ba min got min kasête te li Başûr dîtiye û hunermen-dekî strana te "Tu hingivê li ser zîmanâ" di şahîyekê de gotiye, û ez jî dixwazim navê kompaniya xwe li ser kasête ku hesten me bigîhîn wan, ci xwedî Kompanî, yan saziyên mûzikî bin ji wan re dijîm, eger hûn alîkariyê bikin, bawer bikin ez li gor wê alîkariyê bim, ji ber ez dizanim ci li cem min heye. Û ez û wê çaxê hewl bidim ku tiştekkî nû pêşkê bikim.

- Desteya çandê yan saziyên hunerî di Rêveberiya Xweser de têkîlî bi te re girê nedane?

Mixabin tu kesi têkîlî bi min re nekirine!

- Sedem - di nerîna te de- ci ne?

Di nerîna min de ew jî ji ber ez ser-bixwe û bêləyîn im, kenalîn partîyan min vexwendî pirogrammê xwe kîrin, û kenalî TRT6 a kurdfî şand pî min, ez besdarî pirogrammê bûm, lê mixabin û mixabin qeder û qîmetî ku dan me, ez guman dikim eger saziyên me bidin hunermendîn xwe, iroy roj wê ê hunermend bi azmanê hunerê bikeve.. vê kenalê alîkariyê ta di warê aborî ji de kir. Eger iroy alaveke ragihandînê bisîne pî min, dikarin biaxîvin ka tu li ku ma û gîha ku û cîma tu dereng me.. gîhaye asta ku ez di baranê de bi meşî, dosût û hevalan bi destê min gîrtiye û ez cûme kenalê. Lê dema ez cûm bajarê Amedê, seva berî wê ji min re otel girîtin, du dost ji karmendîn xwe şandin, her yekî bi destekî min gîrtin, şufereke taybet bi wan re, pêşkêş pirogrammê bi xwe hate pêşwaziya min, qedrek dane min, ez gelektiştî matmî mam, kîfeş bûm jî û di heman demê de -mixabin-ez aciz bûm jî, min dixwest ev guhdan ji hîla milletê min li Rojava heba!

- Te çend CD ji bîli wan her du yên pêşî tomar kîrin?

Min Sê CDYê dî tomar kîrin, lê yên pêşî - û pişti pazdeh salan - cîgirtî ne, her sê CD yên dawî yên di salen 2005an bi navê "Dilana şêxanî", 2007 bi navê "Mercanê", û sala 2011an ew jî ya şahîya bû.

- Şoreş li Sûryayê lidar ket, te ci di serê xwe de bir û anî bo tu biki?

Min stranek ji bo şoreş amade dikir, ez haydar dibûm ku stranek weke wê derdiket, ez di wir de radiwestyam, ya

Hevpeyvîn

Qadir Egîd



didwan, eger tu iroy were ji min re bibêjî vaye büyerek bi min re çêbûye, ji min re stranek li ser çêbîke, helbet eger bi heyvan jî bîmîn ez û nikaribim, divê bandorek li min hebe...!

Stayla nû ku di vê demê de ji hêla hunermendîn derketiye, yan wê stran li ser hêzên YPG yan jî li ser hêzên Pêşmerge wê amade bibin, çima te tiştekkî wisa çeneke kîriye û nerîna te di vê yekê de ci ye?

Bi rastî stranek min heye ne li ser hêzân e, lê li ser partîyan e, min tomar kirîye û belav ji kîriye, helbesta wê dibêje:

Tu bê ez û ew bê ez

Bê avdan dimîne rez

Destê xwe tev bi hev din

Yêkîtiyê bikin li lez

Yek bin yek bin yek bin

Yek hêz û helwest bin

Gel bi we bawer nakî

Ger hûn ne destek bin

Parçebûn ne tu kar e

Di laş de weke illet e

Yê ku xwedî bîyar e

Baş bizanî millet e

Ü perçê dawî min ji helbesta hevaledîk xwe navê Ebûd Se'dî ye derxistîye, ew jî dibêje:

Hov e ji me re dîrok

Bes e xap û pêkenok

Em bûne şazde parfü

Ú em bûne hijdeh serok

- Te çîma hewl neda ku tu ji xwe re kilipan çêbîki?

bi rastî hewldan çêbû, lê rewşa aborî ne alîkariya wî dikir, yê min ne pîrs bûn, wek gotinê sivik min digitin bo hindekî ken çêbîke, ji ber ragihandîn divê li gor diîl millet be, lewre min li gor diîl wan tiştin xweş bikar dianî.

- Pişti rawestana Radyoya Vîn, tu radyoya têkîlî bi te re bo pirogrammî girîdane yan an?

Na, nizanîm bi rastî sedem ci ne, tev ku ej zî wan re didim xuyakirin ez dixwazim kar bikim, ne ji bo rewşa aborî, ez dixwazim kar bikim ji ber ej zî wê hunerî hez dikim, min ji gelek dost û hevalan ji xwestiy, min ji Radyoya Arta û Hêvî ji xwest, lê min pêşind bersiv dizanîbû..

Na ye..! Radyoya Hêvî got dibe em nikarîn alîkariya aborî bi te re bikin,

niha ez aborîya xwe di riya mûçekê xwe û Tirkî re dikim, eger şahî jî hebin ez dicişim.

Bi rastî ez dixwazim di radyoya ARTAFM de kar bikim lê derfet nedane min.

- Em werin qonaxa zewaca te, raman û bîyar çawa hat in?

Ji xwe evîna yekem ji hêla min ve bû, ya duwem min jê re hestê xwe gotin, û hev nas kir, têkîlî derdora sal û nîvîkê çêbûn, lê di dema xwestînê de hindek astengî ji hêla malbatâ wan de çêbûn, destpêkî te kesi nas nedikir, lê pişti min ew xwest diyar bû, mixabin ew kesayetiya kurti ku di ber xwe de bide û berevanyê bike tune bû, dawî ez mecbûr bûm em terka hev bikin.

ya sisyan ne ezmûn bû, tenê min ji malbatâ xwest ku yekî min re bibînîn, û ez amade me ku ez er bîkîm, têkîlî çar pênc mehan dûm kirin, û em di 2004an de zewicîn, sê zarokîn min hene (Mihemed, Yehya, û Yûsif).

- Cîma te navê pêşemberan hilbijartîn?

Ez mirovî bi olê ve girêdayî me,

nimêj dikim, rojî digrim, Qur'anî gu-

dar dikim û ezber jî dikim, û dersê Qur'anî jî distinim, min asta Tecwidê jî derbas kîriye, hindek dibêjîn çawa tu mirovî oldar û, û hunermend û oldariya min jî hind

Peyva Mirov.. Mirov Bi Xwe Ye

Şêrko Ebdulrehman

"Peyva te ji bo gavên min çira ye, ronahî ye ji bo riya min".

Zebûr (119:105)

Bi vê ayeta ku di Zebûrû iroz de hatiye nivîsandin, Pêxemberê Xwedê Daûd gazî Xwdan dike û jê re dibêje ku bi gotinê riya mirovan ronî dibe, ev mezmûr an jî ayet zêdeyî 2300 salan li pey xwe hişt ta ku gişa roja me ya ku em lê dijin! Her wiha di vê serdemê de jî em dibêjin peyy, xwendin, nivîsandin zor girîng in.. Gelo çîma peyy di jiyanâ mirovan de girîng e?

Ji ber ku cudahiya mirovan ji lawiran tenê axaftin e, axaftin jî tê wateya hişmendiyâ pir pêşketî. Lewma mirov dema ku baxive peyvîn xwe hildibijêrû bi awayekî nazik û lihevhâti gotinan ji devê xwe tîne der, her wiha malbat zarokên xwe di temenekî diyar de dişinîn dibistanan da ku berî her tişîfîrî hunera xwendin û nivîsandinê bibin. Di vî warî de pirsek xwe dide pêş.. Gelo pêwîst e zarok bi kijan awayî û rîbâzî perwerde bibin, û bi ci zimanî?!. Bi rastî ev demeke mijara perwerdeya seretayî ya zarokan li dibistanen Herêmîn Rojavayê Kurdistanê bûye mijara sereke di hemû mal û kolanan de, her kes van pirsan tîne ziman; ma êdî bûye dema



Metlokên Pêximber Sulêman

pêşgotin

Her olek ji olênu ku bi navê yekîniya xweda bang dîkin, û ev ol diyar in her sê olênu xwedi pirtükîn esmanî ne "Cihû, Xristiyan û Musilmân", her olek jî pirtûka wê ya baytbeh pê heye, û ev her sê pirtûk têne nasin weke belge û binyîada bawermen-diya li cem her kesê bawermend, çi Cihû, Xristiyan, yan jî Musilmaman be. Her yek jî van bawermendan dibîne ku pirtûka wî weke tiştekî navlep û berçav e, ji hîzir û raman re û hişku mirov pê xweda dinase. Dibe ku ew pirtûk yekser daktebi. Wek mînak: Birahîm Pêximber û Mûsa Pêximber, herdiwan şireten xwe jî xweda yekser distendin, dibe ji ku daketina wan pirtûkan bi şêweyki ne yekser be, weke mînak Isa pêximber û Muhammed pêximber silavên Xwedê li ser wan bin.

Wek ku em dizanîn Isa pêximber diyar kir ku ew bi navê Xwedê diaxîvî, û Muhammed pêximber jî peyama xwe ji Cibrîl veguhestibû. Mijara me şireten Silêman pêximber in, ew kurê Dawûd pêximber e, qîralê Isa'listanê bûn.

Metlokên Pêximber Sulêman

1-Ev in metlokên Sulêman Pêximber kurê Dawûd pêximber şahê Israelstan. 2-Ji bo hînbûna şehrezayî û rîz û rîzkan û ji bo sehkîrîna gotinê aqil-mendan.


3-Ji bo standina dersêن çavvekirinê, pakdiliyê, çeyî û rastdiliyê.

4-Da ku mirovîn normal bibin fîris, xort bibin aqilmend û çavvekirî.

5-Bila aqilmend guh bide pêzanîna wî, dê bibe bêtir û yê ku zêrek pê bibe çêtir.

6-Da ku ew bikaribe bîghêje wateya şiretan an mamikan û gotina bîrewaran û aqflînîn da wan seh bike.

7-Tîrsa Xweda destpêka aqlimen-



pendêñ dil û canê xwe li we belav dikim, ez ê gotinê xwe ji we re bidim sehkîrin.

24 – lê her wekî ez bangî we dikim û hûn guh nadine min, û her wekî ez destê xwe didime we û tu kes vî destî nagire.

25 – Ji ber ku hûn şireten min davêjin pişt guhê xwe û hêjî pendêñ min bi yênu ku ez li we disidinim nakin.

26 – Ez jî dema ku hûnê bikevin wêraniyê de bikenim, ez ê henekê xwe bi we bînim çaxa ku tirs û tomet dora we bigire.

27 – Dema ku tirs mîna bazoreki bîhna we dê biçikîne û kambaxî weke bâblisokekî dora we wê bigire û çaxa ku zarî û tengasi zora we dibe.

28 – Hingî ew û bangî min bikin, lê ez li wan venagerînim, ewê li min bigerin, lê min peyda nakin.

29 – Ji ber ku wan guh nedidan pendû şiretan, û nedixwestin tîrsiyarê Xundayê xwe bibin.

30 – Ji ber ku wan hez ji şireten min nedikirin û bi cezayênu ku min pêş wan dikir henekê xwe dianîn.

31 – Bila niha şekiyen omîdê xwe bixun û bi şireten xwe ên kirêt têb bibin.

32 – Serhişkiya bodileyan wan dikuje û xweşîya bodileyan wan winda dike.

33 – Lê yê ku guh dide min bi xweşî wê pal bide li ser xweşîyê dê rojê xwe bibûre û tirs naakev dilê wî.

www.buyerpress.com

buyerpress buyerpress

buyerpresss@gmail.com

WhatsApp 00905368908545

bÜyer
PRESS

Nûçe... Bi Zelaîî

Ziman Û Netew Di Darbesta Ezeziyê De Tê Vekuştin

Ferid Mîtanî

Ziman peyveke ku di hundîre xwe de destan û tekoşinek bêhempa vedihewîne li bal gelê Kurd. Gelek diyar e ku gelê Kurd xweragirtin û berxwedanek herdemî di meydanekê çarenî de dida û dide boşkirin di jér diruşma (Parastin û vejandina ziman û netewê) de. Helbet Kurdên Rojavayê Kurdistanê jî vê xwestekê pîroz dibînin, û her tim di pêşbirka hebûnê de netewa xwe bi rewampakiya şoşergeren xwe diparêzin!

Li ser van hêmanen jorîn partiyen Rojava di sedsala borî de hatîne damezrandin. Béguman pergâl û rîbâznameyên wan ên partîti bi dirusmîn balkêş dihatin sêwirandin û daxwaza wan a serekê ew bû ku masfîn rewşenbîrî bi dest bêxin, milletê Kurjî siyaseta Erebkirinê rîzgar bikin, û zimanê zikmâki di dibistanan de bikar bînin.

Lê tu caran Kurd weki xudanê zimanek kevnâr ji layê rîjîma Sûri ve nedihatîn pejrandin. Bi hatina Buhaba Ereban û vêketina şoşera Sûri re,

hêviyên Kurdên Rojava mezin dibûn. Lê mixabin tevgera siyasi ya Kurdên Rojava karvedan û helwestek lawaz û sermok ji rewşê re dan diyarkirin û her diman di ser û berberiya ezezi û partîti de, û birdoziya binpêkirin û reşkirinê de mejiyê gel de dan çandin. Her hizra netewî di çerxa berjewendiyên kesayetî de dihat piştaştin, bi tu şêweyî pêşşengên gel keys jî vê derfetî neinan bo hînkirina civaka Kurdi li ser ziman, wêje, kevnator û çanda Kurdi.

Bi borina demê re û guhertina pîvanen hêzê li ser zemina Rojava, Kurdan karî rîveberiyekê damezrandin û li ber çava ye ku vê gavê hewldan tên kirin ji bo kurdirkirina biranş û rîbâzen dibistanen seretayî.

Dêmek xwesteka partî û rîexistinê Kurdi di warê rewsenbîrî de pêkhat bi perwerdahîya bi zimanê Kurdi? Na !! Weku her car kîna siyasi û vîna xweperesi dike ku reşkirin, rexnetundi û nepejrandin bibe pêşvanê helwesta besej ji tevgera Kurdi li beramber branşen bi kurdî.

Bi vî şêwazî tevgera Kurdi ne bi tenê



dandanî bi zimên nake, lê bi tundi dibe dijberê ziman û bendê prensipa xwe ya siyasi û li himê xebata şest salî mukur naye.

Bi van bizav û hin kiryarê din weke: koçkirin, derkirin, binçavkirin û gitinî... Tevgera siyasi ya Kurdi her di wêrankirina mala Kurdi de karmendeki çalak c.

Tu caran tevgerere jidil nahete kirin bo xwedikirina nişkî canfida û netewerist ji pêşxistin û parastina welêt re amade be. Mixabin! Her car binyadîn netewyarû û zimanhezî dîbin gorîyên cudatiya idyojoli û hezkirina desthilatdariyê; heman hizir û raman di derin û mejiyê nişen nühatî de tê nimandin û encamên wê siyasetê rasterast li ser erdê xuya dikan.

KANTATA

Brahîm Şêxo

Kantata ji latînî hatiye Cantare û tê wateya strandin, lê ne ya solo (bi tenê) lê belê, Kantata dikare wilo bête têgîhişin, ku berhemekî, ji perçene cuda ava dibe. Perçeyen ku divabê di Kantata de bêne pêkwerîn, ev in: Koro, Axavtin (Itali: Recitare), Ariya (Itali: Aria), Aryoso, Amûrjenîango Instrûmental. Di destpêkê de muzik lê dike (Amûrjenî), dûv re koro derbas dibe, di pey koro re axavtin tê, dûra aria (li vira peyrehvatinek di navbera aria, aryoso [heger dimen anku peyav hîn mezintir, berfirehtir dibe], axavtin... çedibe), li dawîya tevan koroyî dîsan distirê û bi vê strandinê re Kantata bi dawî dibe.

Weke di Kantata-solo heyen. Kantata-solo wesane: Deng distirê û pêre yan orkestra lîdikeve yan ji akord têne dagirtin. Ji forma mezin ji Kantata re tê gotin Oratoryûm (Latînî Oratorium, Orare).

Kantata olin heye, ku girêdayî ola fillehan e -Protîstant-, û ya vekirî anku cîhanîn, ku dikare li ser her tişî bête strandin.

Kantata destpêbû û di sedsala 17min de diyar bû anku em dikarine bîbêjîn

ku hate afirandin û cihê xwe girt. Naskirtirin müzikvanê ku berhemên Kantata nivîsandiye ew e Yohan Sébastien Bach (bi almanî Johann Sebastian Bach) 1685 - 1750. Bach nêzîka 300 Kantatayan nivîsiye. Li kéléka Bach, Ditrîx Bûkstêhûd (bi almanî Dietrich Buxtehude) 1637 - 1707, ku wî jî nêzîka 100 Kantatayan daniye.

Teknîka Kantata ya protêtant: Koro, beri her tişî ya Oratoryûm (jî), rola millet dileyize anku dengê millet distirê. Li vira yek dikare navê Turba-Choir bikar bîne.

Axavtin (Recitare) timmî bi dengê Ténor têne strandin û jê re tête gotin, "Yê Evangêlist", yenî ê axêver rola yê protêtant dileyize. Gava yê Evangêlist distirê an ku diaxive, pir caran bi akorda Major-6 bi riya yan Basso Continuo (li vira jê re tête gotin „Secco“ latînî yenî zuha) an ji orkestra, lîdikeve.

Ji xwe gelek caran di Oratoryûm de û ji ber ku gotinê Kantata piraniya wan ji İncilê ne, gotinê px. İsa gava têne strandin, girûpa kemana tonê melodiya wan gotin pê re dijene.

Kantata di sedsalîn 1800 û 1900 de. Nivîsandina Kantata her berde-wam dibe û gelek müzikvan ví rengî

dîvinîsin. Fêlik Mendilson Bartoldi di Berhema Psalmkantanta, Yohan Simon Mayr di berhemên Egeria, Annibale de û weki din ku nêzîka 60 Kantatayan din ji çekirine. Jak Fromont Halévy di Prométhée enchaîné de. Yohan Brahms di Rinaldo de. Gustav Mahler di berhemâ Das klagende Lied, Nils Vilhêlm Gadê di berhemên Psyche û Korsfarene. Sergêy Ivanoviç Tanejev di berhemâ Johannes von Damaskus û Nach dem Lesen eines Psalms. Herweha gelek û geleken dîrir ji Kantata di sedsala 20mîn de Sérgey Raxmaninov di berhemâ Becha (Buhar) de. Otorino Rêspigi di berhemâ Christus de. Igor Stravinskî di Le Roi des étoiles de. Pawl Hindemith di Lindberghflug de. Bêla Bartok di Cantata Profana de ku wi bi xwe gotinê wê danine. Bincamîn Britin di Saint Nicolas Cantata de. Yun I-sang di Der weise Mann de. Ü gelek geleken dîrir ji.

BANG

-Rêxistina Netewen Yekbûyi bo perwerdekirin, Zanist û Rewşenbîriyê UNESCO".

-Komîteya Navnetewî Ya Şanoyê ITI".


Wekî tê zanîn, li Rojhilata Navîn, gelê Kurd, yek ji gelên Hindo-ewropî yên resen û heri kevnar e ku ji dehê sedsalan ve li ser xaka bav û kalên xwe diji.

Bêvîn û xwesteka wî, welatê wî di nav gelên deverê de hatiye dabeşkirin û bûye çar parce. İro, hejmara wî bêtir ji /40/ milyon mirov ye, li Tirkî, Iran, Iraq û Sûriyê diji. Ü li ser destê rijimên van dewletan, ziman, çand, dîrok û folklorê wî yê netewî, toşî sistem û zordariyeke tund bûye, û hê ji dibe, û bi armanca tunekirina wî, her hewil dane ku vî geli bipişefin, ji holê rakin, bi sextekari, dîroka wî nivîsandîn, û rastiya hebûna wî jî dane mandelê!.

Pişî şopandina me ji kar û xebatê we yêni mirovane û pîroz re ku li ser we yêni mirovane û pîroz re ku li ser

Nameya roja Şano ya cihanî

bi Kurdî



û qenciyê ve biguhêre. Em çaverê û hêvidar in ku rîexistina we "Nameya Roja Cihanî Ya Şanoyê" bi fermî wergerîne bo zimanê Kurdi, da ku gelê me yê Kurd jî bi vê yekê rûmetdar û dilgê bibe, naveroka wê bi zimanê dayika xwe nas bibe, û bêtir bi vê hunera giring a ku gelê me rîz jê re digre, mijûl û şa bibe. Digel rîz û rûmeta me.

"Koma Şano"

Sûriyê/Qamişlo 10.06.2015Z-2627K

Email: koma.shano@outlook.com
Email: komashano@gmail.com
Numreya Sûriyê: 00963938796865
Numreya Turkiyê: 00905318865369

Yekîtiya Nivîskarên Kurd - Sûrya û Yekîtiya Rewşenbîrê Kantona Cizîrê Salve- gera 31emîn Ji Koçkirina Helbestvanê Nemir Cegerxwîn Lidar Dixin

Di roja Îniyê 22 Comtmeħâ/ Oktober 2015an de, Yekîtiya Nivîskarên Kurd - Sûrya û Yekîtiya Rewşenbîrê Kantona Cizîrê di du demêñ cuda de, salvegera 31emîn ji koçkirina helbestvanê nemir Cegerxwîn li ser gorna wî ku di hewşa wî de ye, û bi amadebûn û serdana bi sedan ji nivîskar, rewşenbîr, helbestvan, siyasetmedar, û xelkên Qamişlo lidar xistin.

Destpêk ji katjmîr dehê sibeha bi danîna gurzek gul ji hêla şanda Yekîtiya Nivîskarên Kurd - Sûrya û xwendina destpêka Quranê li ser giyanê helbestvanê nemir bû.. dûv re serdana mîvanan destpê kir, ji wan Abidîn Bedirxan kû li ser gornê peyvek got û tê de behsa jiyanâ helbestvanê nemir û awayê jiyanâ wî kir, û pêşwazîkirina millet jê re piştî ku li welatê xerîbiyê çû ber dilovaniya Xwedê kir.

Sekretêrê partiya Astî a Dimuqrati Kurdi Telal Mihemed gotina partiya xwe xwend û tê de xalin giring ji jiyanâ nemir Cegerxwîn anî ziman.. gotina Partiya Yekîtiya Dimuqrat ji hêla Serkirdeyê partiyê D. Luqman Ebdella hate pêşkeşkirin. Gotina Yekîtiya Rojnamevanê Kurd ê Sûriji hêla Seroka wê Selwa Bedran ve hate xwendin. Herweha seroka nivîsgeha têkiliyê Giştî di şepola Pêşeroj de amade bû, û Fatihe li ser giyanê helbestvanê nemir xwend.

Pişt re Endamê Desteya Reverbîr di Yekîtiya Nivîskarên Kurd - Sûrya de Fewaz Osê bi awa-yekî fermî rêuresmî salvegera 31emîn ji koçkirina helbestvanê nemir Cegerxwîn vekir, ku tê de jî pêşenga hunermend Dildar Felemez ragihand.. Hunermend Felemez ji hêla xwe ve gotinek li ser gora Seyda xwend pêşkêş kir tê de behsa tabloyê pêşkêşkirî kir, û di heman demê de koçkirina hunermendê cihanî Umer Hemdi ku berî çend rojan ji ber nexweşiyek demdar çû ber dilovaniya Xwedê anî ziman.

Felemez ji rojnameya Bûyerpress ragihand û got: "Min 31 tablo bi helkefta salvegera 31emîn ji koçkirina helbestvan Cegerxwîn pêşkêş kirine, û ev tablo hemû berî niha li İspanya, Siwîed, û Ustralya hatine pêşkêşkirin, naveroka tabloyen min, min bi Cegerxwîn ve girê didin".

Gotina Yekîtiya Nivîskarên Kurd - Sûrya û helbesteke bi navê "Bîranîna Seydayê Cegerxwîn" ji hêla serokê yekîtiyê Dilawerê Zengî ve hate xwendin, dûv re helbestvan Dilbirîn Mihemed helbestek bi navê "Bahoz Li Min Rabû" xwend, û gotina partiya Guhertin a Dimuqrati Kurdi ji hêla seroka hevbeş Mizgîn Zêdan ve hate pêşkêşkirin, tê de got Cegerxwîn ji bo jinê li hemû perçeyen cihanê tékoşin kiriye. Ji hêla xwe ve Koma Feraşin bi serpiriştîya Hunermend Sîvan Temo gurzek ji stranê filiklor û hin ji stranê ku gotinê wan ji helbestê nemir Cegerxwîn bûn ji amadekaran re pêşkêş kirin.

Rojnamevan Hesen Zaza ji Rojnameya Bûyerpress re axîvî û got: "Helbestvan Cegerxwîn gelek helbest ji milletê xwe re pêşkêş kirin, û têkiliyê wî bi Kurdê Şamê re xurt bûn, herweha roleke giring di bellevkirina zimanê Kurdi de list". Strana "Eman Dilo" ji hêla kulilkêk ve ku ew ji Hesen Osê bû hate pêşkêşkirin û dilê ama-

debûyan pê ges bû. Sandeke ji serkirdeyê partiya Pêşverû a Dimuqrati Kurdi li Sûrya ku ji D. Ehmed Berekat Endamê Nivîsgeha Siyâsi, Ehmed Silêman Endamê Nivîsgeha Siyâsi, Faris Osman Endamê Komîta Navendî û hin kesayetin dî pêk dihat serdana gorna Seydayê Cegerxwîn kirin û fatihe li ser giyanê wî xwendin, û bi wan re jî girupek Karatê ji heman partiyê serdana gornê kir. Faris Osman di gotina partiyê de xalin ronîday ji jiyanâ helbestvanê nemir anîn ziman. Ji hêla xwe ve D. Ehmed Berekat ji rojnameya Bûyerpress re ragihand ku "Cegerxwîn Efsaneyek ji efsaneyen Kurdistan bûm, û wê di jiyanâ milletê kurd de bimîne".

Şterka Hiphopê hunermend Şerif Omerî hindekî hasten xwe anîn ziman, pişt re stranek ku mijara wê dîjî Koçberîyê bû ji cemaweran re bi coşkeke mezin strand.

Hunermend Se'ed Ferso hindek stranê ji helbesten Cegerxwîn diyarı kesen amadebûyi kir, û yeke taybet diyarı endamên rojnameya Bûyerpress jî kir.

Endamê Desteya Rêvebir ya Yekîtiya Nivîskarên Kurd - Sûrya Cemîl Dahir sê stran pêşkêş kirin, yek ji wan gotin û awazên wî bûn û diyarı giyanê helbestvan Cegerxwîn kir.

Helbestan Can İbrahim ku ji bajarê Kobanî hatibû helbestek xwend û got ev cara yekem e ku ew serdana gornam seydayê Cegerxwîn dike.

Dawayî pirogramma danê sibeha helbestek ji hêla helbestvana kurd Yisra Zibêr ve hate pêşkêşkirin.. û wisa di katjmîr 1,00 de, rêuresmî ku Yekîtiya Nivîskarên Kurd - Sûrya li ser gorina nemir Cegerxwîn lidar xistibidawî bû.

Yekîtiya Rewşenbîrê Kantona Cizîrê ji hêla xwe ve rêuressmin taybet bo salvagera 31emîn ji koçkirina helbestvanê nemir Cegerxwîn û bi amadebûna Serokê Desteya Karê Derve Ebdiķerîm Umer, Seroka Desteya çandê li Kantona Cizîrê Bêrîvan Xalid, û Serkirdeyê (Tev - Demê) Ebdiķerîm Ehmed li lidar xist, ku katjmîr 3ê piştî nîvîro serokê hevbeş ê Yekîtiyê, bi awa-yekî fermî û bi rawestana xuleke bêdeng li ser giyanê şehîden şorêşê û giyanê Seydayê Cegerxwîn dest bi pirogramê xwe kirin.

Gotina Yekîtiya Rewşenbîrê Kantona Cizîrê ji hêla mamoste Tel El - Şêx ve ku ew jî kurtejiyana helbestvan Cegerxwîn bû bi zimanê Erebî hate xwendin.

Pişt re serkirde Ebdiķerîm Ehmed gotina Tevgera Civaka

Dimuqrat (Tev-Dem) xwend, û tê de got: "Têkçûna tirorê li Kobanî mîna fêkçûna Nazîyê li Elmania, û Faşiyê li Italya bû". Û derbarê zimanê kurdî Ehmed wisa got: "Zimanê me nasnamaya me ye, zimanê kurdî zimanê hêja ye, divê em zimanê xwe di van helkeftan de ges bikin, em ê zimanê xwe zindî bikin, ji ber ew bingeha şaristaniya me ye.. de werin em Rojava bi hev re ava bikin ji ber ew mala me hemûyîn e".

Gotina partiya Pêşverû a Dimuqrati Kurdi li Sûrya ji hêla Endamê Komîta Navendî Faris Osman ve hate xwendin û tê de got: "Em iroj salvegera helbestvan Cegerxwîn.. Helbestvan Partiya Pêşverû lidar dixin.. Helbestvan Cegerxwîn hêja ye Xelata Nobil.. Divê em cîhanê tev de bi berhemên helbestvanê xwe bidin nasîn".

Seroka Desteya çandê li "Kantona Cizîrê" Bêrîvan Xalid di gotina xwe de got: "Cegerxwîn hêja ye em wî di bîrê de bînîn, ji ber wî bi helbesten xwe xetîra şoreşa azadî, zaniest, û wêjeyê vêxist".

Salihê Silo Kevintirîn hevalên Seydayê Cegerxwîn li wir amade bû, û helbestek ji helbesten wî bi navê "Ji Dostê Re ci Rêkim Ez Diyarî" bi awayê stranî pêşkêş kir.

Helbestvan û nivîskar Taha Xelî di gotina xwe de diyar kir ku Seydayê Cegerxwîn ne kêmî helbestvanê Daxistanî Resûl Hemzatof e, lê Daxistan guh da nivîsen Hemzatof û piraniya berhemên wî hatin wergerandin bo zimanê cihanî, lewre stêrka wî roni da. Pişt re helbestvan Bawer Can ji bajarê Hesekê helbestek ji yê Seydayê Cegerxwîn xwend.

Helbestvanê kurd Ferhadê Merdê Helbestek dijî koçberîyê, û bi coşkeke germ û mezin xwend, tê de ji koçberan xwest eger ji welat derketin tiştekî bi xwe re nebin.. ta bîranînan jî.

Nivîskar û zimanzanê Kurd Subhî Ehmed ji Girkê Legê gotinek got û tê de xalin taybet ji jiyanâ Seyda da xuyakirin, pişt re helbestvan Arşek Baravî hindek ji helbesten xwe pêşkêş kirin, û Enwer El - Sofî ji bajarê Dêrikê helbestek li ser pakrewanan xwend, herweha helbestvan Dilbirîn Mihemed ji helbesta xwe xwend.

Gotina peymangha Cegerxwîn a zimanê Kurdi ji hêla mamoste Necla Xelef de hate xwendin. Dûmahiya ahengê xwendina helbesta helbestvan Hisen Eli bi navê (Ji Vê Xakê) ku bi zimanê Erebî ji hêla helbestvan Bêkes Darî ve hate xwendin bû.



Federasyona Fitbolê Ya Kurdistanê Çalakiyên Xwe Radigre



basnews

Federasyona Futbola Kurdistanê jiber rewşa herêmé bîryar da çalakiyên xwe rabigre.

Federasyonê diyar kir ku hemû hevrikiyên vê heftê yên xula Kurdistanê dê neyê encamdan û çavdêriya rewşê bikin.

Jiber rewşa ne aram ya li bajarê Silêmanî û navçeyên wê, Federasyona Futbola Kurdistanê bîryar da ku çalakî û karên xwe bi awayek demkî bide sekinandin.

Li gor bernameyê divîya di vî hefteyê de hevrikiyên pleyên sêyem, yê ciwanan û yariyên keçan bihata encamdan.

Peyva wendayî

1	2	3	4	5	6	7	8
1 H	E	S	K	I	R	I	N
2 P	Î	R	A	K	Û	B	N
3 K	O	P	A	L	B	N	Ê
4 D	A	R	Ê	Û	L	A	N
5 Ê	R	O	T	B	A	Y	A
6 Y	E	D	U	I	K	Ê	V
7 Z	O	R	Ê	R	Û	B	I
8 Z	A	V	A	Y	Ê	I	Ş

Bûka pîr û zavayê kal, du şivanêni bi kopal. Bi darê zorê, heskirin nayê torê.

Peyva wendayî: Ji 5 tîpan: Rojnameyeke li Rojava derdi keve.

Kurdî Xweshe

قمة	kumbet
مجاني	miftî
تعاطف	hevsojî
تحذير	haydan
أساس	xîm
كفو، قادر	hemser
سر	penhanî
تحفة	mûze
تحفة	perûk
مخدر، تحذير	benckirin




Sînga Xwe Ji Pençeşêrê Biparêzin!



Di nav jinan de nexweşîya herî zêde tê dîtin pençeşêra sîngê ye. Ev nexweşîya ku ji sedî 25'ê jinan dixe tora xwe roj bi roj zêde dibe. Ji bo hestiyariya vê nexweşîye meha Cotmehê wek meha têgîhandina pençeşêra sîngê tê hatîye destnîşankirin û di vê mehê de li dij vê nexweşîyê hin çalakî têne da ku jin bala xwe bidine vê nexweşîyê; Lewre teşxîsa zû weke her pençeşêran di pençeşêra sîngê de jî roleke girîng dîlze. Ji bo kedeke me jî li ser nasîna vê nexweşînê bibe, me xwe gîhand cerahê giştî, Serokê Komeleya

Nexweşîyen Sîngê û Endamê Lijneya Rêveber a Federasyona Komeleyen Nexweşîyen Sîngê Doç. Dr. Sadullah Girgin û ahagîyen girîng jê sitidin. Girgin grîngîya teşxîsa lezgîn a pençeşêra sîngî destnîşan kir û da zanîn ku ji 8 an jî 10 jinan yet tûşî vê nexweşîyê dibe û ev tê wê wateyê ku salê 500 hezar jînji ber vê nexweşînê jîyana xwe ji dest didin. 'Pêkera herî girîng ostrojen e' Doç. Dr. Sadullah Girgin da zanîn ku pençeşêra sîngî li cîhanê di nav jinan de cureya herî belavbûyi ya pençeşêran, pençeşêra sîngê ye û ji % 33'ên pençeşêrên ku di nav jinan de peyda dibin, a sîngê ye. Gir-

gin got ku li gor daneyên Rêxistina Tenduristîyê ya Cîhanê, her sal 500 hezar kes ji ber pençeşêra sîngî jîyana xwe ji dest didin. Girgin, sedemîn vê pençeşêriyê wisa rîz kir: "Di pençeşêra sîngê de pêkera herî girîng, jîn bûn bixwe ye, lewre jî 100 qet ji mîran zêdetir dikevin vê nexweşînê. Ev nexweşîn girîdayî hormona jinan a bi navê ostrojen e. ji xeynî wê, regîlen pêşwext, menopozîn derengketî, bikaranîna dûvedirêj û ne birêkûpêk ên dermanî kontrola zayînê, dermanîn ostrojenê dihewînin ku ji bo kêmkirina gîlî û gazînê piştî menopozî didin jinan ew pêkhateyan in ku rîska pençeşêriya sîngê zêdetir dîkin."




Xaçerêz

ASOYÎ

- 1-Helbestevanekî kurd e.
- 2-Zimanekî cîhanî ye - Ji bo biçükîrinê.
- 3-Zarok jê re bû, Ez ê(di gelekjimarê de) - Tersî na(vajî).
- 4-Pora hûnandî (vajî)- Zîlam (biçükîri).
- 5-Alava rastkirina cilan- Xelas bû.
- 6-Agir - nvr(belawela).
- 7-Derbas bû - Wek hev - Nexweşî.
- 8-Bîçûkino(vajî).
- 9-Xweşîk (bi zaravê zaro-kan)- Beyreq(vajî) - Temen (bi Erebî).
- 10-Sîm - Ji çekên şer bû.

STÛNÎ

- 1-Bajarê birca belek.
- 2-Nas dike(vajî) - şewq.
- 3-Wek hev- Ji dengdêran e, Nîvê/dûrtir/.
- 4-Kehrebe.
- 5-Serokê mîrîtiyê - Rojeke heftiyê - Ayînî.
- 6-Qerefîl - Zimanê xweçîhî(vajî).
- 7-ew, ji gelekjimarê re - wek hev.
- 8-dema çûyî(vajî)-ji rengan.
- 9-çûne dilovanîyê (vajî) - Min(di zaravê de).
- 10- Xwîşkê - Eşyb.



Hejmara bûrî



Bersiva hejmara 29an: kil û kildan

Zûbêjj

Çewalê Cehê Cimo li
Ber çem çiriya



Mamik ???

Sermişar e, pêxepar e, heçî nezane de-
war e. Çîye?